

# Manîfestoya hilbijartinê 2019-2022

**BI HEV RE JI BO EWLEHÎ  
Û ÊMINÎ Û PÊŞKEFTINÊ**

Li Sandivikenê gelek tişt hene ku em pê kêfxweş bibin. Zaroxane tê berfireh kirin, xaniyê nû yê pîran Ängsbacken her îsal tê vekirin û em bûn belediyeyê kulturê ya sala 2018. Lê em zêdetir dixwazin.

Ji bo ku neewlehî û neêminî bê kê m kirin, tedbîrên weha - mîna dibistana xurtkirî û avahiyên werzişê yên serdemî - yên ku hêviya paşerojê dibexşin şert in. Em dê vê bi hev re bikin!



Socialdemokraterna  
i Sandviken

---

# **Sandviken - belediyeya**

## **pîşesazî û kulturî ya serdemî**

Sandviken dê bibe belediyeyeka pîşesazî û kulturî ya serdemî. Em li vê derê behsa hemû pirsan nakin yê ku em dê li ser bixebitin da bigehin wê armancê, lê tiştên ku em fikir dikin giring in tên nîşan dan.

Mimkin e civakeka sosyaldemokrat li cihekê diyarkirî bê ava kirin, lê serkêşiyeka sosyaldemokrat ya neteweyî û hêrêmî ji bo siyaseteka sosyaldemokrat ya xurt jî şert e.

Em yê sosyaldemokrat nexweşan dananin hember sihetbaşan yan pîran hember ciwanan yan mêran hember jinan yan bajaran hember gundan yan kesên ku kar dikin hember kesên ku kar ji destê wan çûye. Sandvikenana me civakeka vekirî ya pirçandî, demokratîk, wekhev û yeksan e.

**Dengê te biryarder e.**

**Em te jî di roja hilbijartinê de dihesibînin!**

---

# Belediyeyeka ku mezin dibe

- **Gundewariyeka jîndar û navendeka bazarî ya zindî belediyeyê pêşve dibe**
- **Divê welatî di pêşvebirina belediyeyê beşdar bin**
- **Em dê taxên biavahî yên li gor şertên akincîbûnê yên paşerojê ava bikin**
- **Em dê berfirehkirina xeta înternetê li tevahiya belediyeyê bidomînin**

---

# **Kar û pêşveçûna borî ji bo baweriya paşerojê**

- **Em dê xwendina mezinan berfireh bikin û dê bala xwe zêdetir bidin pîşeyên lazim**
- **Çalakî yê delîveyên karî peyda dikin dê ji bo bêkaran bîn pêşkêş kirin**
- **Em dê bi qabiliyetan alîkariya bazara karî ya paşerojê bikin**
- **Divê ji bo şirketan bicihbûn û pêşveçûna xebatê li Sandvikenê hêsan be**
- **Divê lihevhatinên aborî cihên tedbîq û pratîkê û ji bo kardaran şertên baş peyda bike û ji bo şirketên mehelî û xwecih da ku beşdarkar bin û pêş bikevin îmkanên baş bide**

---

# Zanîn Sandvikenê bihêztir dike

- Li dibistanên Sandvikenê, divê zarok û şagird li ser awayê fêrbûna xwe xwedî tesîreka rastî bin
- Hemû şagird yê ku xwendina bingehî temam dikin divê ji bo bernameyeka neteweyî ya lîseyê [yan xwendina paşbingehî] qebûlbar bin
- Divê xwendîgehên me yê lîseyî/paşbingehî hezên şagirdan û hewcedariyên bazara karî bi cih bin
- Em dixwazin sinorên cudakariyê bişkînin da xwendin û perwerdehiya baş û hevqîmet bibe heqê her kesî

---

# Lênêrîn û sexbêriya baş li tevahiya belediyeyê

- Divê karmendên warê sexbêriyê demekê zêdetir ji bo çavdêriya welatiyan hebe
- Divê sexbêrîxwaz di warê çawaniya bicihanîna tedbîrên sexbêriyê de azadtir be
- Divê ewlehî û êminî di sexbêriyê de û xweseriya sexbêrîxwazan zêde bibe
- Divê sexbêrîxwaz karibe di hêla pêşvebirina hezên xwe de berdewam be
- Divê pereyên mişterek ji bo qezenca şirketên şexsî neyên bi kar anîn

---

# **Sandvikeneka domdar**

- **Em dixwazin zanîne li ser pirsên jîngehê zêde bikin**
- **Divê nisbeta xwarina ekolojîk û nêzikçandî li belediyeyê zêde bibe**
- **Em dê car û wesayitên veguhastinê kêr bikin û ji bo trafîkeka giştî ya baştir bixebitin**
- **Em dixwazin Sandvikenê bikin belediyeyeka bisiklêtan**
- **Storsjön pirseka jîngehê û vehesîne ya girîng e**

---

# **Hevgirtin ji bo ewlehî û eminya zêdetir**

- **Em dê civakekê ava bikin ku em di ser sinorên tebeqe û klasan re bîn ba hev da ku nixên demokratîk xurt bikin**
- **Em dê ji bo bajar û gundan jîngehên jiyanê yê xebatbar ava bikin**
- **Em dê li dijî cudakariyê rawestin û herêmên ku rewşa wan ya civakî û aborî lawaz e hilînin**

## **Sosyaldemokrat li Sandvikenê**

**Malper:** [sapsandviken.se](http://sapsandviken.se)

**Facebook:** [facebook.com/s.sandviken](https://facebook.com/s.sandviken)

**Twitter:** [twitter.com/ssandviken](https://twitter.com/ssandviken)